
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1295 | 3-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 5 cihên şûnwariyê...(1)

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke kevnar e. Ji van cihên şûnwariyê devera Tilhelef, Hemoker, Şikefta Duderî, Tilberî û Kelha Necim e.**




**Tilhelef**

Li başûr-rojhilatê Sûriyeyê cih digire; rojavayê bajarê Serê Kaniyê ye. Ew li devera kaniyên ku dibin jêdera Çemê Xabûrê cih digire. Ew mezintirîn rûbarê ku tevlî Çemê Feratê dibe. Tilhelef navê niha yê vî cihî ye. Ew di hezarê beriya zayînê de bi navê Gozana dihat naskirin. Ew cih, cihê bajarekî şûnwarî yê Sûriyeyê ye û nûnertiya demeke dîrokî ya Mezopotamyayê, dike. Tê de şûnwarên ku vedigerin serdema kevirî ya ku nû hatin vedîtin û ev şaristanî bi navê şaristaniya Tilhelefê hat binavkirin. Cerrên wê bi teşeyên geometrî û yên lawirî dihatin xemilandin. Ev şûnwar dîroka wan vedigere 6 hezar sal berî zayînê û piştî wê ew bû cihê dewleta Aramî-Gozana.

**Hemoker**

Hemoker bajarekî dîrokî ye û li gorî şûnwarnasan, lêkoler û daneyan, Hemoker di dîrokê de bajarê herî kevnar e. Ew li Bakur û Rojhilatê Sûriyê cih digire. Dîroka wê vedigere bêhtirî 7 hezar sal. Ew nêzî gundê El-Huriyeyê yê bajarê Til Koçer yê dervera Dêrikê tê gumankirin ku niştecihên wê derdora 25 hezar mirovî bû. Li vî cihê dîrokî hin şûnwar hatin dîtn ku pêşketina hunera nîgar, tiraşkarî û neqşandinê raber dikin. Her weha li vi cihê dîrokî hin tişt hatin dîtin ku wê weke yekem bajar dibîne. Di vî cihî de, sîstema hênkkirinê ya herî kevin hat dîtin. Di navbera dîwarên duyane yên rastinhev de, valahîne ku ne zêdeyî 15 santimetreyan bûn, hebûn. Van valahiyan rê dida hênkkerê ku avhewaya germ hênik bike. Niştecihbûn ji 5 hezar sal berî zayînê heta serdema islamî berdewam kir. Ev cihê şûnwarî bi riya topografiyayê re û tiştên şûnwarî ku li rû hatin dîtin, eşker bûn.

**Tilberî**

Cihê şûnwarî li parêzgeha Hesekê ye; 55 kîlo metreyan li rojhilatî başûrê Hesekê cih digire. Ew di nava xwe de komeke mezin ji girên şûnwarî yên Cizîra Feratiyê diheywîne. Ew li beravên rojhilat ên Çemê Ceqceqê cih digire. Di sala 1980'î de vekolîn bi serperiştiya şandeya Îtalî (Profisor Imilyo Bîkorîla) bi hevkariya desteya şûnewaran dest pê kir. Di encama lêkolînên vê şandeyê de, qatên şûnwarî yên ku dema wan vedigerin 3 hezar sal berî zayînê, bi taybet dema ku Romanî, ew hatin vedîtin. Herwiha cerrên ku vedigerin serdema elparsî, xişir û gerdenî û kevirên giranbuha yên baziltî hatin vedîtin. Ev kevir ji bo hêran û bilatên ku ji kerivrên mermerê yên serdema Aşûrî ya nûjen) dihatin bikaranîn. Herwiha morên bronzî û latikên mizmarî ku vedigerin serdema Aşûriya navîn û nûjen, hatin vedîtin. Di heman demê de dolab û firaxên qehfikî ku vedigerin serdema Akadî, hatin vedîtin.

**Keleh a Necim**

Kelha Necim a dîrokî 30 kîlometreyan li rojhilatê bajarê Minbicê ye, ew dikeve hêla rastê ya çemê Feratê, bi cihê xwe yê stratejîk tê naskirin ku dikeve ser riyên bazirganiya navneteweyî yên kevnar (Riya Herîr). Herwiha weke xaleke leşkerî û xwediya avahîsaziyek taybet tê naskirin ku bêhtir dişibe Keleha Helebê. Ew deriyê ketin û derbasbûna ji Şamê ber bi Mezopotamyayê ve ye, û yek ji şûnwarên li bakurê rojhilatê Sûriyê ku hînî ji hinekî xweşikbûn û şêwaza xwe ya avahîsaziyê diparêze. Li dora wê pir şûnwar û keleh hene, mîna Kirkimîş, Carabulus Elqşeriyê Elcerf Elehmer û Kehla Yusuf Paşa, hem jî kelekha Meskene Keleha Caaberû Dura Europos jî hene. Pêdiviya Keheha Necim bi xebatên parastin û sererastkirinê heye û pêwîst e bibe muzexaneyek arkeoloîk ku şûnwar û şaristaniya Geliyê Firatê dihêwîne, herwiha pêwîst e ku têkeve lîsteya Mîratêyên Cîhanî.

**Şikefta Duderî li Efrînê**

Şikefta Duderî li bajarê Efrînê ya Rojavayê Kurdistanê ye, dîroka wê vedigere 100 hezar sal berî zayînê û hin jêder dibêjin ku dîroka wê vedigere 80 hezar sal. Yek ji girîngtirîn cih li ser asta cîhanê ye, hejmareke şaristanî hatine û çûne. Di wê şikeftê de hestiyên mirovê Niyandirtal hatin dîtin û derxistin. Di sala 1950'î de hin peykerên şûnwarî hatin derxistin, dîroka wan vedigerin 6 herzar sal berî zayînê. Di sala 1993'yan de hestiyên zarokekî ji mirovê Niyandirtal hatin dîtin, ew jî vedigere berî 100 hezar salî. Wateya navê wê diyar e, ji ber ku du deriyên wê hene. Lêkolîner tekez dikin ku dîroka wê ji ya Şikeftê Şander a li Hewlêrê kevintir e, ji ber ku dîroka wê berî 70 hezar salî ye. Şikefta Duderî yek ji cihên geştiyarî bû, salane bi hezaran kes rû rê dikirin. Piştî dagîrkirina Turkiyê ji Efrînê re, ew cih weke bi sedan cihên din, hatiye paşguhxistin û têkdan. Jêdera agahinê li ser Şikefta Duderî ji Edhem Şêxo, Zekeriya Huserî û Mehdî Kakayî hatine girtin.

## Gotina Dawî



### Bawerî bi hêza QSD'ê tê!

**Mihemed Seydi**

Sûriya êdî bûye welatekî bê xwedî ku li başûrê wê Îsraîl dibe serwer û li bakurê wê dewleta Tirk hin dever fermî dagirkirine. Li nava wê jî DAIŞ û çete û li Şamê jî tunderew û selefî desthilatin. Piştî zêdetirî 12 sala ji şerê navxweyî ku di encamê de hemû tunderewên cîhanê di bin navê cîhadê de li Sûriyê hatin komkirin, welat û welatî tar û mar bûn. Lê li bakurê Sûriyê Kurd wekî miletekî ku serî natewîne mohra xwe li vê serdemê xistin û hêdî hêdî bi pêkhateyên din ên herêmê re yekrêziya xwe ava kirin û bi hêz bûn.
Her wiha rêveberiyek jî hat avakirin û hêza leşkerî di bin navê QSD'ê de hêdî hêdî mezin bû û pêşengî ji şerê li dijî DAIŞ'ê re kir. Di vê demê de, desthilata Baas ku digot ew serweriya welat diparêze, destek neda vê herêmê ku xwe ji êrişên barbarên DAIŞ'ê biparêzin û li aliyê din dewleta Tirk hebû ku hemû destek dida DAIŞ'ê da ku qira Kurdan bîne û herêmê bi riya çeteyan kontrol bike. Lê çibû? DAIŞ têk çû li dû wê plana dewleta Tirk, rêjîma Şamê hilweşiya û serokê wê reviya. Li aliyê din, komên radîkal ên hinekî di kontrola hêzên Rojavayî de, hatin destekkirin û li Şamê hatin bicihkirin. Ew jî koma Cebhet El-Nusra ku şaxa El-Qaida ya Sûriyê ye. Kiras ji serok û endamên van koman hatin danîn û taxim û Karavêt li wan hat kirin û hinekî rî û porê wan hate qusandin û pêşkêşî xelkê Sûriyê wek desthilata nû hat kirin.
Piştî ku ev desthilata çêkirî li Şamê li ser koşkê hat danîn, bi her awayî hate nepixandin heta ku li Berava Sûriyê li dijî Elewiyan komkujî pêk hat. Paşê hat hişyarkirin û careke din pesna Ehmed El-Şeri ango Colanî hat dayîn heta ku li Siwêdayê jî bi destê komên wî komkujî li dijî Durziyan pêk hatin. Vê carê çiqas xwestin rûyê Colanî û desthilata wî bişon, lê êdî li her deverê hat rûreşkirin û nema tiştek feyde dike. Herwiha koma Colanî jî ket ferqê ku rewşa wan gelekî zehmet bûye, vê carê li ser navê Wezareta derve ya desthilata Şamê Eseid El-Şêbanî li Rûsiya derket ku ew di lîsteya wî welatî ya terorê de ne. Desthilata Colanî wiha difikire ku dema ew razîbûna hemû dewletên di dosiya Sûriyê de bi bandor bistînin, ew ê bi her awayî li ser desthilatê bimînin. Dîsa wiha difikirin ku ew ê jî çawa dewleta Tirk di navber hêzên Rojavayî û Rûsiya de diçû û dihat û alî bi çûna aliyên din tehdîd dikirin, ew ê jî wiha bikin. Lê li ser navê Wezareta Karê derve ya DYA piştî hevdîtina desthilata Şamê li Rûsiya, daxuyaniyek hat dayîn ku tê de hat gotin: " Sûriya hîne ji lîsteya dewletên ku terorê xwedî dike nehatiye derxistin û ew ê di bin çavdêriyê de bin. Yanî, DYA ji Colanî û yên dora wî re dibêje ku me hûn anîne û em biryara we didin û ger hûn bi dûvê xwe bilîzin, hûn dizanin hûn kîne. Di vir de jî dixwazim bibêjim ku yên siyaseteke li ser rêgez û prensîbên baş ên Civakî nemeşîne, ew ê di nava qada navdewletî de jî cih ji xwe re nebîne. Ji bo wê, îro hêza ku her kes bi serê wê sond duxwe, ew hêze ku Kurd pêşengiya wê dikin û ne dûre ku sibê pêşengiya tevahî gelê Sûriyê jî bikin.

### Sudoku:Pirs 51

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 1 | | | | 2 | | | |
| | 5 | 7 | | 6 | | | | 4 |
| | 6 | 9 | 3 | 8 | | | | |
| | | 4 | | 9 | | 1 | 2 | |
| 3 | | | | | | | | 5 |
| | 2 | 8 | | 4 | | 3 | | |
| | | | | 7 | 5 | 4 | 8 | |
| 9 | | | | 3 | | 6 | 1 | |
| | | | 8 | | | | 9 | |

### Sudoku: Bersiv 50

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 7 | 2 | 4 | 6 | 1 | 5 | 3 | 9 |
| 9 | 4 | 3 | 5 | 7 | 8 | 6 | 2 | 1 |
| 5 | 6 | 1 | 3 | 2 | 9 | 4 | 8 | 7 |
| 2 | 8 | 7 | 6 | 1 | 5 | 9 | 4 | 3 |
| 3 | 5 | 4 | 7 | 9 | 2 | 1 | 6 | 8 |
| 6 | 1 | 9 | 8 | 4 | 3 | 7 | 5 | 2 |
| 4 | 9 | 8 | 2 | 5 | 7 | 3 | 1 | 6 |
| 1 | 3 | 6 | 9 | 8 | 4 | 2 | 7 | 5 |
| 7 | 2 | 5 | 1 | 3 | 6 | 8 | 9 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER VEŞARTIN Û NEBIHÎSTINÊ**

**Axaft guhê min:**
- Ji min tenê re got; eşkere negot; ji min pê ve ti kesî nebihîst; bi dizî got.

**Bibihîze û di avê de berde:**
- Ji ti kesî re nebêje.

**Binberr kir:**
- Veşart; ji xwe re hilanî.

**Bincil kir:**
- Bi heman wateyê.

**Binçal kir:**
- Bi heman wateyê.

**Binerd kir:**
- Bi heman wateyê.

**Binqesîl kir:**
- Bi heman wateyê.

**Bi destê rastê dide, bi destê çepê distîne:**
- Li ber çavan qenc xuya dike, lê di rastiyê de ne wisa ye.

**Bila di navbera me de be:**
- Ji ti kesî re nebêje; bila ti kes pê nizanibe.

**Bila ya te di dilê te de be:**
- Armanc û daxwaziyên xwe ji ti kesî re nebêje.

**Binlam kir:**
- Di bin lama xwe de got; bi awayekî eşkere negot; tiştek ji gotinên wî nehat fêmkirin.

**Bi vî destî dide, bi wî destî distîne:**
- Çawa ku qenciyê bike xuya dike, lê ne wisa ye; mirovan dixapîne.

**Bi xwe re bibe gorê:**
-Ji ti kesî re nebêje; bila di navbera min û te de bimîne.

**Binê zimanê wî şil e:**
- Tiştna dizane lê vedişêre; tiştna dizane lê newêre bêje.

**Bîra bêbinî ye:**
- Kûr e; xefên wî pir in; nayê naskirin.

**Çal kir:**
- Gotina xwe veşart.

**Dadiqurtîne:**
- Berdide nava xwe; ji ti kesî re nabêje.

Dadiûre:
- Bi heman wateyê.

**Deva-deva dibêjin:**
- Wê mijarê bi dizî ji hev re diêjin; bi pistepistê ji hev re dibêjin.

**Devê xwe venekir:**
- Tiştek negot; xefên xwe eşkere nekirin; tiştên ku dizaniyan negotin.

**Devê xwe tev weranî:**
- Di bin lama xwe de got; bi awayekî eşkere negot; tiştek ji gotinên wî nehat fêmkirin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Dilvîn û Rîham bi destê qehremanan ji dojeha DAIŞ'ê hatine rizgarkirin



Çîrokên fermana hovane ku civaka Êzidî tê re derbas bûye, ne tenê bi fermana herî dawî ya 3'ê Tebaxa 2014'an re, îfade dike. Di 74 fermanan de ev civak bûye qurbaniya zihniyetên dijmirov, olperest û netewperestiyê...**R-2**

# 11 sal bûrîn, hîna çarenivîsa zêdeyî 6 hezar Êzidî ne diyar e

11 sal li ser fermana 74'an a ku çeteyên DAIŞ'ê di derheqê civaka Êzidî de pêk anî, derbas bûn. DAIŞ'ê bi hovîtî civaka Êzidî li Şengalê di 3'ê Tebaxa sala 2014'an de da ber qirkirinê. Piştî 11 salan hîna jî çarenivîsa 6 hezar û 417 kesên Êzidî ne diyar e.**R-5**



# 'Li gorî derfetan em xizmeta zarokên nexweş dikin'



Rêvebera nexweşxaneya Onkolojî, Şewat û Telasîmiyayê Hediya Ebdela diyar kir ku ew li gorî derfetên Heyva Sor a Kurd xizmeta zarokên nexweşiya telasîmiyayê dikin û got, "Pêwîst e rêxistinên tenduristî û mirovî bi erkê xwe rabin û destekê bidin Heyva Sor a Kurd."**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1295 | 3-Tebax-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# HIKMET HEBÎB: PÊŞEROJA SÛRIYÊ DI YEKÎTÎ Û HEVGIRTINA GELAN DE YE

Endamê Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hikmet Hebîb diyar kir ku hikumeta veguhêz a Şamê cihê ku li gor hêvî û daxwazên gelên Sûriyê tevbigere, berovajî wê roj bi roj desteka civakê winda dike û wiha got: "Ji bo diyarkirina pêşeroja Sûriyê pêwîst e yekîtî û hevgirtina gelan pêk were."**R-4**



# Kêmbûna çanda xwendinê



Xwediyê pirtûkxaneya Manîsiya, Azad Dawûd diyarkir ku çanda xwendina pirtûkên bi zimanê Kurdî gelekî kêm bûye û ev yek cihê xemgîniyê ye û pêwîst heya ku mirov bixwîne ji ber ku kesê dixwîne dizane li derdora wî çi çêdibe.**R-7**



**Salvegera Fermana Şengalê**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



**'Evîna Derwêş û Edûlê'**
Remezan Olçen R-7

# Sîstema nenavendî wê mafê gelan li Sûriyê biparêze

Navendîbûna Sûriyê ne tenê pirsgirêka gelê Kurd e, lê belê pirsgirêka tevahî Sûriyê ye ji ber ku ev kirîz mafê tu kesî di Sûriyê de naparêze, lê belê Sûriyê ber bi alozî û qirkirinê ve dibe.**R-3**



# Dilvîn û Rîham bi destê qehremanan ji dojeha DAIŞ'ê hatine rizgarkirin

Çîrokên fermana hovane ku civaka Êzidî tê re derbas bûye, ne tenê bi fermana herî dawî ya 3'ê Tebaxa 2014'an re, îfade dike. Di 74 fermanan de ev civak bûye qurbaniya zihniyetên dijmirov, olperest û netewperestiyê. Di salvegera komkujiya 2014'an de em serpêhatiyên du jinên ku ji destê DAIŞ'ê ji aliyê hêzên YPJ'ê ve hatine rizgarkirin, vedibêjin.

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Di 3'ê Tebaxa 2014'an de fermana 74'an li ser civaka Êzîdî li Şengalê pêk hat. Ev komkujî û ferman bi mabesta qirkirina civaka Êzîdî hate kirin. Di encama vê fermanê de bi hezaran gelê Êzîdî hatin kuştin, koçberkirin û bi taybet bi siyaseteke pir qirêj jin û zarok ji xwe re birin û mezin kirin. Di hurguliyên wê serdemê de gelek siyaset û nêzîkatiyên qirêj li ser jinan û zarokan hatin meşandin. Lê piştî bidawîkirina terora DAIŞ'ê di Sûriyê û herêmên Rêvebriya Xweser de, bi hezaran jin û zarok ji aliyê YPJ-YPG û HSD'ê ve ji destê wan hatin rizgarkirin û heyanî niha jî tên rizgarkirin.
Dibe ku ev çîrokên fermanê weke hev xuya dikin, ji ber ku hemû jî behsa trajediyeke mezin dikin. Her wiha behsa hovîtiyeke mezin dikin. Dibe ku zeman û mekana ku ev çîrok lê derbas dibin yek bin, dibe ku çîroka jin, zarok û kalemêran weke hev bin. Ji ber ku hemû ji civakek bûn. Lê her yek ji wan xwedî paşeroj, xwedî jiyan û xwedî siberojekê bûn. Eger em bi ziravî berê xwe bidin rastiya van çîrokan, yek ji van çîrokan jî naşibe yê din.

### Dîlgirtina 5 salan a Dilvîn Qasim a di destê DAIŞ'ê de

Dilvîn Qasim ji gundê Til Qeseb a ser bi Şingalê ye. Ew jî yek ji jinên dîlgirtî ya dema fermanê ye. Dilvîn Qasim, pîştî pênc salên dîlgirtinê, di sala 2019'an de li gel malbata xwe bi alikariya Rêveberiya Xweser a Rojavayê Kurdistanê ji Kampa Holê ji destê DAIŞ'ê hatiye rizgar kirin. Niha li gundê Til Qeseb bi zarokên xwe re dijî. Lê pîştî 11 salên fermanê heta niha, ji hevjînê xwe Salih û ji xwezûrê xwe ti agahî negirtiye. Kurekî wê, di dema esaretê de li gundekî bajarê Dêrazorê di êrişa balafirên Koalisyona Navnetewî ya li dijî DAIŞ'ê de, li gel wê tê kuştin. Bêyî ku em zêde bikevin navberê, emê ji zimanê wê, çîroka wê guhdar bikin û binivîsin.

### Dilvîn û malbata xwe pêk ve têne girtin

Dilvîn Qasim bi dilgiranî behsa wan kêliyan dike ku çeteyên DAÎŞ'ê êrişê Şengalê dikin: "Dema DAIŞ'ê êriş kir, em li mala xwe bûn. Em ji malê derketin, me berê xwe da Çiyayê Şengalê. Me xwe gihand çiyê. Dema em li çiyê bûn, hin kes agahî ji bo me şandin û gotin vegerin tiştekî nîne. Em jî vegeriyan, di dema vegerê de em li nezî Gundê Solax bûn çeteyên DAIŞ'ê em girtin. Dema em hatin gîrtîn ez û 6 zarokên min ku hemû zarok biçûk bûn, hevjînê min, xwezûr û xwesûya min em bi hev re hatin girtin. Ji malbata mala bavê min jî xwişk û birayê min hatin girtin. Weke din, di nav girtiyan de malbatên nêzî me hebûn."
Firotina jinên Êzidî, îşkenceya li zarokan
Rojên dîlgirtinê yên di destê DAIŞ'ê de bi zor, zehmetî û îşkence derbas dibe ku Dilvîn Qasim bi kelegirî dikare behs bike: "Îşkence li zarokên me dikirin. Bi darê zorê, bi zarokên me Kurean didan xwendin. Bi darê zorê nimêj bi wan didan kirin. Li zarokan didan, tî û bîrçî dihiştin. Jin û keçên Êzîdiyan li sûk û bazaran difirotin. Jin û zarokên Êzîdiyan ji xwe re dikirin kole. Ji bo ku em bitirsin, kesên dikuştin dîmenên wan dikşandin û ew dîmen bi me didan temaşekirin".

### Rêwîtiya di dîlgirtinê de

Di dema esaretiyê de, Dilvîn Qasim û zarokên wê ji Şengalê ber bi Telafer, Badûş, Reqa, Tebqa dikevin nav rêwitiya esaretê. Dilvîn Qasim wiha behsa vê rêwitiyê dike: "3'ê Tebaxa 2014'an em li Gundê Solax girtin, seatên nivrojê bû. Wê rojê heta evarê li ber dikanên ser rêya bajarê Şengalê em dan sekinandin. Dema bû şev, em bi seyaran birin navçeya Tilafer. Li Tilafer em xistin nav medreseyekê. Em mehekî li Tilafer bûn, her carê cihe me diguherandin lê em her li Tilafer bûn. Ji Tilefer em birin zîndana Badûş, ji wê derê em birin gundê Kesîr Mehrem. Nêzî du mehan em li wî gundî man ji wê derê em birin Sûriyê".

### Çûna Baxoz û Kampa Holê

Dilvîn Qasim û malbata wê, ji roja fermanê heya sala 2019'an, bajar bajar digerin lê her esîrên di destê DAIŞ'ê de ne. Piştî ew dibin Sûriyê, zêdetir li Tebqa û Reqayê dimînin, Dilvîn Qasim wiha pê de diçe: "Dema em li Sûriyê bûn dem bi dem cihê me dihat guherandin. Em zêdetir li bajarê Reqa, Tebqa li wan bajar diman. Dema şer li wê derê zêde bû em anîn Baxozê, ji wê derê jî bi jinên DAÎŞ'î re em anîn Kampa Holê. Jinên Êzîdî yên esîr, di kampên cuda de didin sekinandin. Yan jî, ji ber hemû jinan çarşefên reş li xwe dikirin, me yek ji yekê nas nedikir".

### Pêngava QSD'ê, Rojên Rizgarî û Azadiyê

Piştî 5 salên esaretê, êdî rojên xilasiyê ji Dilvîn Qasim re xuya dikir. Di sala 2019'an de, bi pêşengiya hêzên QSD'ê derbên giran li DAIŞ'ê hatin xistin û bi hezaran êsîrên di destê DAIŞ'ê de hatin rizgarkirin. Dilvîn Qasim wiha behsa roja rizgariyê dike: "Em ji Kampa Holê xilas bûn. Sala 2019'an bû, Mala Êzîdiyan a Rojavayê Kurdistanê hatin û ez û zarokên min em ji Kampa Holê xilas kirin. Dema em xilas kirin agahiya me jê nîn bû. Şevekî du-sê kes hatin Kampa Hole ku em jî tê de bûn. Ew kesên hatin kampê, navên me gotin. Lê ji ber me ew nas nedikir em tirsiyan, me navê xwe negot. Berê çeteyan em tirsandibûn. Dema navê me hate xwendin, me ji wan re gote ne em in. Kesên hatibûn ji me re gotin 'me ev agahî ji malbatên we girtine.' Wê şevê em ji Kampa Holê derxistin. Em birin Mala Êzîdiyan a li Rojava. Em 20 roj li mala wan man. Pîşt re em gihandin malbatên me, em hatin Şengalê".

### 'Ez dixwazim hestiyên kurê xwe bînîm Şengalê'

Yek ji kurên Dilvîn Qasim, dema ku di destê DAIŞ'ê de êsîr e li Dêrezorê di encama bomberana balefirên Koalîsyona Navnetewî de canê xwe ji dest dide. Dilvîn Qasim wiha behsa vê bûyerê dike: "Em li Dêrazorê bûn, di navbera gundê Haçîn û Susa de em diman. Em esîrên di destê DAÎŞ'ê de bûn. Êrîşên balafirên koalisyonê, li ser qadên DAÎŞ'ê çêbûn. Wê demê êrîşên balafiran li ser cihê ku em lê bûn çêbû. Kurê min jî wekî êsîr di destê DAÎŞ'ê de bû. Ew ji li gel me bû. Wê demê disa cihe kû em lê diman êrîşên balafiran çêbû, di wan êrîşan de kurê min şehîd



**Dilvîn qasêm**

bû. Hefteyekê cenazeya wî li erdê ma, pîşt re kurê min ê li gel min bû, em çûn me cenazê wî li wê derê hilanî. Cihe ku min kurê xwe binax kiriye ez dizanim. Li hemberî Mizgefta Rahmane mezargeh heye, me li wê mezargehê gor kir. Niha ez ji kesên pêwendidar daxwaza alîkariyê dikim. Bi min re bibin alîkar, ez dixwazim hestiyên kurê xwe binim, li mezargehên Şengalê bidim axê".

### Hevjîn û xwezurê Dilvînê wenda ne

Dilvîn Qasim ev 11 sal in ji hevjinê xwe û xwezûrê xwe ti agahi negirtiye, çarenûsa wan ne diyar e. Dilvîn Qasim bi van gotinan daxwaza alîkariyê dike: "Hevjînê min Salih û bavê wî, dema li gundê Solaxê em girtin em li gel hev bûn. Pîştî wê rojê edî min ew nedîtine û de derheqê wan de ti agahiya me nîne. Daxwaza min, bila ji bo êsîrên me yên di destê DAÎŞ'ê de ne xebatekê bê meşandin û bila bên xilas kirin. Daxwaza min a dawî ev e. Bila kesên wenda, ya bi saxî ya jî hestiyên wan ji bo me bînîn".

### Rîham Hecî jina herî dawî a ku ji aliyê YPJ'ê ve ji destê DAIŞ'ê hatiye rizgarkirin

Bi salvegera komkujiya 3'ê Tebaxê re herî dawî di 24'ê Tîrmehê de Hêzên YPJ'ê Jina Êzidî a bi navê Rîham Hecî ku ji destê DAIŞ'ê rizgarkiribûn, rizgarkirina wê ragihandin û radestî Hêzên Şengalê kirin. Rêham jina herî dawî ku ji destê terora DAIŞ'ê hatiye rizgarkirine ku bi sedan jin û zarokên weke Rîham hene li benda rizgarkirinê ne.
Rîham di sala 2014'an de ji aliyê terora DAIŞ'ê ve di dagirkirina Şingalê de hate revandin. Rîham Hecî yek ji zêdetirî sê hezar jin û zarokên ku hatine revandin bû ku heya niha jî hin jinên Îzidî di destê wan de ne. Dema Rîhan



**Rîham Hecî**

hatiye revandin ev 10 salî bû. dema vegeriya mal ew bûbû 21 salî. Rîham piştî 11 salan di encama oparasyoneke hêzên YPj'ê de hate rizgarkirin. Piştî Rîham hat rizgarkirin nêzî 5 heyvan weke ku wê aniye ziman li gel Hêzên YPJ'ê ma û xwedî lê derketin.
Dema Rîham wê vegeriya ba Şingalê gel Malbata xwe, ew ji aliyê Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), radestî Yekîneyên Berxwedana Şingalê (YBŞ) û Yekîneyên Jinên Şingalê (YJŞ) hat kirin.

### Rêwîtiya Rîhamê

Rêwîtiya bi êş a Rîhamê dema ku ew deh salî bû dest pê kir, dema ku ew ligel xwişka xwe, pênc birayên xwe û çend xizmên xwe di dema dagirkirina navçeya Xanesor a Şingalê ji aliyê DAIŞê ve di sala 2014an de hatin revandin.
Rîhamê ji medyayên civakî û torên ragihandê yên ku tevlî bûye de behsa jiyan û hestên xwe dema girtine dike ku wiha dibêje: "Ez nêzîkî heft mehan bi jina Ebûbekir el-Bexdadî re jiyam. El-Bexdadî bi xwe hewl dida ku min neçar bike ez bibim keça wî û jiyana min bi tevahî kontrol bike. Wî ji min xwest ku ez her tiştê li ser eslê xwe, ol û malbata xwe ya Êzîdî ji bîr bikim. Min red kir, lê wan zext li min kirin".
Rîham dibêje, "Tevî zehmetiya jiyanê û zexta giran, min teslîmî hewldanên wan ên ji bo jêbirina nasnameya min nebûm. Min her roj bi hêviya vegerandina cem malbata xwe dijiyam. Îro, piştî 11 salan ji veqetandinê, ez bawer nakim ku ez vegeriyame hembêza birayên xwe, xwişk û bavê xwe."
Rîham tenê xwişk û birayên xwe bi bîr tîne, lê ji ber ku temenê wê biçûk bû dema ew hate revandin, ew nikare endamên din ên malbata xwe bi bîr bîne. Ew tekez dike ku bandora wan salên dijwar bi hêsanî nayê jêbirin.



# Kêmbûna çanda xwendinê

Xwediyê pirtûkxaneya Manîsiya, Azad Dawûd diyarkir ku çanda xwendina pirtûkên bi zimanê Kurdî gelekî kêm bûye û ev yek cihê xemgîniyê ye û pêwîstî heya ku mirov bixwîne ji ber ku kesê dixwîne dizane li derdora wî çi çêdibe.

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Azad Dawûd ji sala 2006'an ve karê kirîn û firotina pirtûkan li Şamê dikir û ji sala 2016'an ve ev kar derbasî bajarê Dêrikê jî kir. Di pirtûkxaneyê de hemû peşên pirtûkan hene çi çîrok, roman, pirtûkên olî, kovarên zarokan..hwd. Di heman demê de cihê xwendinê jî li pirtûkxaneyê heye.
Di derbarê karê pirtûkxaneya Manîsiya û rewşa xwendinê li Rojavayê Kurdistanê Xwediyê pirtûkxaneya Manîsiya Azad Dawûd ji Rojnameya me re axivî.

### Pirtûkxaneya Manîsiya

Azad Dawûd da zanîn ku ji sala 2016'an ve wî pirtûkxaneya Manîsiya li bajarê Dêrikê vekiriye û wiha got:" Dema me pirtûkxane vekir cihê me teng bû, lewma ji sala 2020'an ve me cihekî mezintir kirê kir da ku cihê xwendinê jî têde hebe. Cihê kevin hîn vekiriye bavê min li wir dimîne û ez jî li vî cihî me. Ev pirtûkxane 3'ê qatên wê hene di qata jor de ferheng û pirtûkên zarokan bi zimanê kurmancî, erebî, ingilîzî û bi hin zimanên din jî hene. Di qata duyem de bêtirî xwe roman, pirtûkên kurdî û pirtûkên fikrîne, di qata jêr de jî pirtûkên kevin hene temenê wan vedgere zêdeyî 200 salî û rojnameyên kevin



jî li cem me hene temenê wan ji 60 heya 100 salî ne. Tevî ku firotina pirtûkên bi zimanê erebî yê kevin li vir zehmete jî lê dîsa em wan li cem xwe dihewînin, pirtûkên kurdî jî yên kevin li cem me hene ew tenê tên firotin ji ber ku saziya zimanê kurdî her sal wan dibe. Destpêkê me pirtûkên kurdî hemû ji Bakurê Kurdistanê werdigirtin, lê piştî rewşa çapê li Rojavayê Kurdistanê baş bû û weşanxane li vir çêbûn êdî me piraniya xwe ji vir werdigirtin û tiştên ku li vir peyda nedibûn me ji Bakurê Kurdistanê tanîn. Lê pirtûkên erebî her sal li gor pêşengehan, salnan me ji Libnanê, Îmarat tanî lê piraniya wan em ji Başûrê Kurdistanê tînin."

### Xwendina pirtûkên kurdî kême

Dawûd axaftinên xwe berdewam kir û wiha got:"Ev nêzî sê sala ye em nema ji Başûrê Kurdistanê pirtûkan tînin, ji ber ku rêveberiya Fişxabûr astengiyan derdixin û nahêlin pirtûk bi hêsanî derbas bibin û heger ku derbas bibin jî yan divê erê kirin hebe yan jî pêwîste ku nas bikin naveroka wan pirtûkan li ser çiye. Nêzîkbûnên rêveberiya Fişxabûrê dibe sedem de em di milê madî de zererê bibînin, lewma me nema ji wir pirtûk anîn. Di heman demê de em pirtûkan ji Şam û Helebê jî tînin û ev 5 sal in me di pirtûkxaneyê de refek taybet ji bo pirtûkên pevguhertinê heye, angu kesên ku pirtûk li cem wan hebin dikarin bînin û bi hinekî din re biguherînin. Herwiha kesên ku nikaribin pirtûkan bikirin û bixwazin bixwînin dibin û piştî xwendina wê bidawî bikin careke din vegerînin. Ev nêzî 8 sala ye me ev pirtûkxane vekiriye û heya roja îro em kar û xebatên xwe berdewamdikin, piraniya xwe gel romanên bi zimanê erebî dixwînin. Heya roja îro jî xwendina pirtûkên kurdî gelekî kêm e, hîn ew çanda xwendina pirtûkên kurdî di nav xwendevanan de belavnebûye û ev yek cihê xemgîniyê ye. Di Sûrî de bêtirî xwe pirtûkên naveroka wan lawaze hatine belav kirin, hin çapxane hene bê destûra nivîskar pirtûkên wan çap dikin û bi bihayekî erzan difroşin, em wan pirtûkan nayînin, em tenê yên orcînal tînin, lê buhayê wan jî gelekî giranin û kirîna wan jî zehmettire ji yên din."

### Xwîner qedrê berhemê nagire

Xwediyê pirtûkxaneya Manîsiya Azad Dawûd axaftinên xwe bidawî kir û wiha got: "Ev bû çar sal ku ez di pirtûkxaneyê de kar dikim û me derfet ji bona her kesî avakirine ku berê xwe bidin vir û bixwînin. Lê di dema dawiyê de û ji ber ku derfetên me kêmin me nekarî ku em hemû pirtûkên heyî deynin lipêşiya xwîneran. Her wiha hin kes hebûn qedrê berhemên heyî nedigirtin û pirî caran heya ku xwendina wê bidawî dikirin pirtûk diqetiya û êdî mirov nedikarî careke din bixwîne. Ev yek hem bandora xwe li ser kesên ku dixwestin careke din wan pirtûkan bixwînin dikir, herwiha ji bona firotinê jî buhayê wê dişkest. Lê ruxmî vê yekê jî heger hin kes bixwazibin werin em derî li ber tu kesî nagirin. Em heyanî neha bi navê pirtûkxaneya Manîsiya tevlî 8 pêşengehên Şehîdn Herekol a pirtûkan bûne û îsal jî em amadekariyê xwe dikin da ku em tevlî bibin. Astengiyên ku derdikevin pêşiya me ew e ku xerckirina pereyan zêdetir diçe ji bona kiriya pirtûkxaneyê, kehrebe, av û tiştên din û ew ji buhayê wergirtina pirtûkan bêtire. Daxwza me ew e ku her kes bixwîne, ji ber ku mirovê dixwîne asta pêzanîna wî/wê pêşdikeve."

# Çend gotin li ser wêjeyê (5)

**Cîger Efrîn**

Di nava wêjevan û nivîskaran de mijara ka bi kîjan zimanî were nivîsandin, pir tê gengeşekirin. Hinek dibêjin; "bi kîjan zimanî were nivîsandin ne girîng e. Ya girîng babeta ku girtî dest Kurdistanî ye yan na?"
Em pirseke wiha bipirsin; wêjevanekî Fransî li ser Rûsya bi zimanê Fransî romanek nivîsiye. Mijar tev li Rûsya derbas dibe. Gelo ew romana dikeve nav edebiyeta Rûsî an dikeve nav edebiyeta Fransî? Em mînakeke şênber bidin; nivîskar û wêjevan A. MAULOF, wekî tê zanîn bi eslê xwe Libnanî ye. Lê hema hema hemû xebat, berhemên wî li ser rojhilata navîn in. Mînak; romana "BAXÊ RONAHIYÊ", li ser jiyan û ola wî hatiye nivîsandin. Gelo em ê vê romanê ji edebiyeta Fransî bihesibînin, an ji edebiyeta Erebî? Ji ber ku yên jiyana A. MAULOF dizanin ku ew ji Libnanê ye, wê dîsa bibe mijara gengaşê. Lê kesên ku nizanin ku, ew ji kîjan welatî ye û pirtûka wî ya resen bixwînin, wê rasterast bêjin ku, ew ji edebiyeta Fransî ye. Mesele pirtûkên Yaşar Kemal, mirov nikare têxe nav edebiyeta Kurdî, wî bi nivîsandina bi zimanê Tirkî, zimanê Tirkî jî pêş xist, lê tu tevkariya berhemên wî ji zimanê Kurdî re çênebûye. Ji lewra mirov pir bi hêsanî dikare bêje ku, kîjan berhem bi kîjan zimanî hate nivîsandin ji edebiyeta wî gelî tê hesibandin.
1-Bi taybetî di vê serdema ku dinya her biçûk dibe de û zimanên ku xwe negihînin asta ku civak pê bixwîne-binivisîne wê bi tunebûnê re rû bi rû bimînin, nivîsandina bi zimanê gelê xwe ji her demê pirtir pêwîstî û xebateke dîrokî ye.
2-Di siberojê de gava lêkolînvanan li ser çanda Kurdî lêkolîn kirin, wê bikevin pey pirtûkên Kurdî û ji wan fêrî çanda Kurdî bibin. Ango ew kesên ku dibêjin; "Ez ne ji bo îro dinivîsim" jî, pêwîstiyeke ku bi Kurdî binivisîne derdikeve pêşberî me.
3-Ji ber dagirkeriyê û qedexekirina çand û zimanê Kurdî û gelek kesan ji bo ku stratejîk neponijîn ji bo çend qurişan û debara xwe bikin, bi zimanê dagirkeran nivisîn. Ji lewra jî pirtûkxaneya me Kurdan pir zêde hejar e. Gelekî ku 40-50 milyon e herî kêm divê 4-5 milyon pirtûkên wî hebin. Lê hêj jî qala çend hezaran tê kirin. Beriya şoreşê kesên ku dikarîn bi Kurdî bixwînin-binivîsin pir kêm bûn. Lê niha gel heya ku bi Kurdî dixwîne-dinivisîne zêde bû ye.
4-Wêje bi qasî ku, bîrdanka civakê hişyar dihêle, ewqas jî zimanê gelekî bi pêş dixe û yekbûneke zimanî di nava gel-civakê de dide çêkirin. Mînak; Goethe bi helbest, drama û berhemên din zimanê Almanî ava kir û dewlemend kir. William Shakespeare ziman û çanda Ingilîz pêş xist. Di vir de ev pirs têne hişê mirov;
a-Çima Goethe, an jî Shakespearekî/e Kurdan dernekeve?
b- Em ê heta kengê di xizmeta dagirkerên xwe de bin û ziman û çanda wan Dewlemend bikin?
c- Gotina serdestan a ku dibêje; "Zimanê Kurdî tune ye", hinek jî dibêjin "zimanê Kurdî têrê nake ku mirov pê romaneke, helbestekê binivisîne".Gelo em bi nenivîsandina bi zimanê Kurdî ew angaştên serdestan piştrast nakin?
5-Di vê serdema ku zimanên nebûne zimanê bazarê, nebûna zimanê dibistanê, nebûne zimanê teknolojiyê ji hêla zimanên xurt ve bi hêsanî têne daqurtandin, pêwîstî bi pirtir nivîsandina bi zimanê Kurdî heye. Ji bo em keda dê û bavên xwe li xwe helal bikin û rûreş derbasî rûpelên dîrokê nebin, divê em pirtir bi Kurdî binivîsin.
Bi kurtasî, berhemek bi kîjan zimanî hatibe nivîsandin ji edebiyata gelê ku bi wî zimanî diaxife tê hesibandin. Naveroka wê berhemê çi dibe bila bibe, li ser kîjan gelî hatibe nivîsandin bila hatibe nivîsandin, zimanê berhemê dayîka wê berhemê jî diyar dike.
Belê, êdî dem hatiye û heta di ser re jî derbas dibe ku, her mirovekê Kurd ku dikare pênûsê bigire divê bi zimanê dayîka me yê şêrîn berhemên hêja biafirîne. Dem dema xurtkirin û dewlemendkirina çand û zimanê Kurdî ye.



## 'Evîna Derwêş û Edûlê'

**Remezan Olçen**

Hunergeha Welat li ware şoreşê bi berhemeke nû dîsa karekî bedew kir. Destê wan sax be. Her kesê ku di vî karî de cih girtî pîroz dikim. 'Evîna Derwêş û Edûlê' bûye yek ji şahkarên Hunergeha Welat. Keda wan sax be. Bi dehan hunermend di vî karî de ked dane, li pişt kamerayê jî bi dehan kedkarên din hene, tevî sazî û dezgeh. Mirov çiqas malavahiya wan bike wê kêm bimîne.
Heftiya borî min li ser têgeha'bêkobûnê' ya Sîmone Weil nivîsîbû. Di wê nivîsê de bi referansa xanima Weil min destnîşan kiribû ku ji bo civak bikaribe koka xwe berde jê re ax lazim e. Lê ev ax bi qasî erda welat e, jê zûdetir û muhîmtir zîhniyet e. Bi saya xebatên weke 'Evîna Derwêş û Edûlê' em dibinînin ku kok bi rastî jî hem li ser erda welat û hem jî li zîhniyetê çawa dikare bi kûraniya ve biçe û me zêdetir bike aydî xwe. Ev mozîkal xebatên wê bi mehan dewam kiriye. Lê di salvegera 11'an a Fermana 3'yê Tebaxê hat weşandin. Ev jî bi serê xwe hêja ye ku mirov li serê analîz û tehlîlan bike. Ev nîşaneyan dîroka me ya bi jan e. Lê bi qasî jan, êş û azar nîşaneya berxwedanê ye. Nîşaneya qehremaniyê ye. Nîşaneya dilsoziya bi nirxan re ye. Heta van salên dawîn jî min ji xwe re digot; çi evîneke mezin lê têkçûyî. Bes îro roj ez êdî bi wî çavî lê nanêrim. Di esasê xwe de ew evîn nemiriye, ew evîn têk neçûye. Ew evîn her zindî maye. Her dem û dewrênê xwe bi rengekî din nîşan daye.
Di dema Derwêş de jî dîsa li ser erdê welatê me şerekî bêexlaq li hemberî gelê me dihat meşandi, îro jî tê meşandin. Hingê jî evîndarên saf û pak ên weke Edûlê û Derwêş hebûn, li dijî vî şerî li ber xwe didan îro roj jî bi hezaran Derwêş û Edûlê hene ji bo parastina evîn û heqîqetê, hebûn û azadiyê li ber xwe didin. Îcar bi saya vê xebata hêja ya Hunergeha Welat me ji îro pireyek çêkir bir duh. Me şahidî li duh kir ku em îro jê dersan derxin. Bi zarê şêrîn Kurdî vejandina vê destine, vê lehengiyê wê bi xwe re hafizayê jî vejîne, zindî bike. Reng, deng û dîmen kêlî bi kêlî me li cewhera me vedigerîne.
Bi saya xebatên bi vî rengî ku bi awayekî kollektîf tên amadekirin, mirov bi hebûn û xwebûna xwe dihise. Mirov bi xwe û zimanê xwe, bi xwe û çanda û dîroka xwe dihise. Ev serketina hunera birra û rastîn e. Tişta ku xanima Weil ji bo kokê dibêje, Kok temasa bi heqîqetê re ye ev tişt e. Hunera birra dike ku em temasê heqîqetê bikin. Ma ne Rêber Apo dibêje; "Heqîqet eşq e, eşq jiyana azad e." Em çiqas temasê heqîqetê bikin em temasê eşqê dikin. Eşq û evîna Derwêş û Edûlê ji ber wê ne eşq û evîneke mecasî û plastîk e. Ew eşq û evîneke rastîn û birra ye. Ji ber wê em di wê eşqê de heqîqetê û jiyana azad dibînin. Em di wê eşqê de kok û rehên xwe, ziman û çanda xwe dibînin. Careke din mala we ava Hunergeha Welat hûn her hebin.

# ‘Li gorî derfetan em xizmeta zarokên nexweş dikin’

Rêvebera nexweşxaneya Onkolojî, Şewat û Telasîmiyayê Hediya Ebdela diyar kir ku ew li gorî derfetên Heyva Sor a Kurd xizmeta zarokên nexweşiya telasîmiyayê dikin û got, “Pêwîst e rêxistinên tenduristî û mirovî bi erkê xwe rabin û destekê bidin Heyva Sor a Kurd."

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Nexweşxaniya Onkolojî, Şewat û Telasmiyayê girêdayî Heyva Sor a Kurd di dawiya sala 2023’an de hate avakirin. Herwiha bi vekirina vê nexweşxaniyê re barê nexweşê telasmiyayê gelekî sivkbû, ji ber ku berî niha tu nexweşxane û navend tunebûn ku xizmeta van nexweşan bikin. Her tim kesên nexweş berê xwe didan nexweşxaneyên bi dirav, lê ev nexweşxaneya Telasmiyayê bi destkdayîna Hevya Sor a Kurd xizmeta gelek nexweşan dike.

Di derbarê xebat, piroje û zehmetiyên nexweşxaneya Onkolojî, Şewat û Telasmiyayê de Rêvebera nexweşxaneyê Hediya Ebdela ji Rojnameya me re axivî.





**‘Mehê du caran zarok xwînê distînin’**

Hediya Ebdela anî ziman ku ew li gorî derfetên Heyva Sor a Kurd xizmeta nexweşên nexweşiya telasmiyayê dikin û wiha got: “Em hewl didin ku li gorî derfetên xwe bi nexweşan re bibin alîkar û du bijîşkên herî jêhatî di herêmê de li nexweşxaneyê hene. Herwiha mehê du caran zarokên nexweşiya Telasmiyayê xwînê distînin, zarok xwînê bi giştî nagire lê gilokên sor yên di nava xwînê de bi riya cîhazê cudakirina xwînê hildigirin. Ev cîhazê cudakirina xwînê di herêmê de li nexwşxaneya Telasmiyayê tenê heye. Dema ku gilokên sor bin nexweş di aliyê tendurstî de rewşa wî baştir dibe, zêdtir sûdê jê digirin û xwîn bi wan re dirêj dike. Amûrên tenduristî yên herî pêşketî li nexweşaxaneya hene. Di heman demê de, me ji bo piskilojiya zarokan odeyeke lîstokan çêkirye, da ku zarokên nexwş dema xwe derbaskin û êşa xwe jibîr bikin.”

**‘Hejmara zarokên bi nexweşiya telasmiyayê 370 ne’**

Hediya Ebdela da zanîn ku hejmara zarokên bi nexweşiya telasmiyayê 370 ne û wiha pê de çû:“ Astengiyên ku em dibîn ew jî kêmbûna derfetaye, ji ber ku tu rêxistinên tendurstî û mirovî destekê na din me. Herwiha Heyva Sor a Kurd tenê xizmeta nexweşan dike û barê herî giran li ser milê wê ye. Di heman demê de, pêwîst e rêxistinên tendurstî û mirovî bi erkê xwe rabin û destekê bidin Heyva Sor a Kurd. Da ku Heyva Sor a Kurd karibe hemû amûrên tenduristî û derman ji bo nexweşan re peyî da bike û xizmeta wan bike. Niha di vê demê de me ji bo ciwanên nexweş dest bi perwerdekirina zimanê engilêzî di nava nexweşxaneyê de kirye, ji ber ku ev ciwanên nexweş ji ber nexweşiya xwe nikarin biçin dibistanê. Herwiha me dest bi perwerdekirina kîmûter jî ji bo ciwanên nexweş re kiriye, lewma em semînerên piskilojî pêşkeş dikin ji bo ciwanên nexweş, da ku ciwanên nexweş xwe di nava civakê de kêm nebîne û jiyana xwe norman berdewam bikin.”

Rêvebera nexweşxaneya Onkolojî, Şewat û telasmiyayê Hediya Ebdela axaftina xwe wiha bi dawî kir: “ Banga min ew ku rêxistinên mirovî û tenduristî alîkariyê bi me re bikin, da ku em karibin xizmeta nexweşan bikin. Herwiha em bi hêvî ne bi giştî nexweşên me her tim rewşa wan a tenduristî baş be û ev nexweşiya telasmiyayê di nava civakê de kêm bibe.”

## Salvegera Fermana Şengalê



Hafiz Ahmet Turhalli

Yazdeh sal di ser qirkirina Êzidiyên Şengalê ve derbas bû. Ev qirkirin li ber çavê cîhanê rû da bû. Ji ber Êzidî Kurd bûn û qirkirina Kurdan jî bi lihevkirina Lozanê hatibû pejirandin, qirkirina Kurdên Ezidî jî, bi bêdengiyê derbas dikir. Lewre Kurd bi erêkirina desthelatên cîhanê ji maf û nasnameyên xwe yên netewî bêpar hatibûn hiştin.

Ji ber Kurd bi lihevkirina navdewletî tune hatin hesibandin û Êzidî jî kok û bingehên kurdeyatiyê bûn, kuştin û qirkirina wan jî ne xema cihana desthelatdaran bû. Berovajî di berjewendîyên polîtikayên wan de bû.

Li gor cendermeyên vê sîstemê yên Rojhelata Navîn weke dewletên Tirk, Ereb û Farisan jî, qirkirina Êzidiyan cîhê şanazî û kêfxweşîyê bû. Ji ber vê neyartiya wan a kûr û bêwijdan, tunnekirina Kurdên resen bi kêfxweşî pêşwazî kirin. Êzidî hem ji hêla resenbûna Kurdî ve û hemjî, ji cudabûna wan ya olî ve gepa herî rehet dihatin dîtin.

Li gor plan û projeyên dewletên heremî û palpiştên wan, çawa be Kurd ev sedsale bê xwediye û bi xwe jî ne xwedan hêza paristinê ye.

Ev rewşa bêxwedîbûnê destên dijminên Kurdan bi hêz dikir û Êzidiyên Şengalê li ber çavê mirovahiyê dihatin qetilkirin.

Ev nêrîna ku ji hêla dewletên hawîrdor û navdewletî ve weke firsendekî dîrokî ji bo tunnekirina Kurdan dihate dîtin, misilmanên desthelatdar û nîjadperestên Ereb, Fars û Tirkan dixwestin bi yekcarî temam bikin. Bi vê hişmendiya hov û tirsonek lêz dan hemû cure hevkariya DAIŞên berber. Bajarê

Mûsil û gelek cîhên dîtir di destên DAIŞ’ê de hatin berdan da ku DAIŞ berê xwe bi hêsanî bide Şengalê û hemû Kurdistanê.

Armanca sereke ya van êrîşan bidawîanîna Kurd û Kurdistanê bû.

Bajarên sereke weke Mûsil, Reqa û gelek bajarokên cîranên Kurdistanê hemû radestî wan hovan kirin.

Di vê qirkirinê de weke hijmara fermî: 6417 kes hatin revandin. Ji vanan 3 hezar û 548 jin û 2 hezar û 869 zilam bûn, di nava wan de gelek zarok jî hebûn.

Bi hezaran hatin kuştin, bi deh hezaran ji warên xwe hatin derkirin, malê wan hate talankirin.

3 meha Tebaxa 2014‘an de ne tenê Êzidî hatin qirkirin: bi gelê me ye Êzidî re, mirovahî, ol, mezhep, hişmendî, demokrasî, sosyalîzm û exlaq jî hatin tunekirin.

Ji xwe welatên herêmî yên ku axa Kurdistanê dagir kirine, Îslam an nirx û baweriyên herêmî, ji bo wan tenê amûrên desthelatê ne.

Bi van êrîşên hovane û ne camêrane, çanda Îslamî û ya Rojhelata Navîn jî rûxandin.

Bi van êrîşên hovane, zemîna modernîta kapîtalîst jî heta dawî li ser xaka Rojhelata Navîn vekirin.

Çanda berê ya civakî, olî û bihevre jiyankirinê jî bi dawî kirin.

Carekî din egîd û mêrxasên Kurd, pêşî li van hovan û piştgirên wan girtin. Bi can û xwîna xwe çanda Rojhelata Navîn parastin.

Bi têkbirina DAÎŞ’ê re carekî din, deriyê bihevre jîyina olan, mezheban û milletan vekirin.

Neha jî li Şengalê gelê me yê Ezidî, li ser vê qirkirinê jiyanekî ava dike, divê heta dawî ji bo xweseriya Şengalê piştgiriya gelê me yê Êzîdî were kirin.

Divê em milletê Kurd van karesatan tu carî jibîr nekin û nedin jibîrkirin, da ku em karibin çanda xweparastinê û rêxistinkirinê zindî bihêlin.

Kurd bi Êzidî, Elewî, Mesihî, Cuhî, Misilmanê xwe divê Şengalê weke despêkekî nû ya jiyanê li Kurdistan û Rojhelata Navîn bibîne û Şengalê biparêze.

# Kilînka Elhikme ya tedawiya xwezayî

**Berçem Silêman/ Dêrik**

**Yek ji kilînkên tedawiya xwezayî li bajarê Dêrikê, kilînka Al-Hikmê ye. Ev kilînk ji aliyê mamosteyê sporê Zuhêr Dîban ve hatiye vikirin û ji bo tedawiya bi dermanên xwezayî nexweş serêldanê dikin.**

Di civaka Kurdistanê de tedawiya bi dermanên xwezayî xwedî girîngiyeke taybet e. Çiqasî pêşketin li cîhanê çêbibe û dermanên pêşketî derkevin jî, rêjiyeke ji gel berê xwe dide cihên tedawyên xwezayî da ku çareseriyekî ji nexweşiyên xwe re bibînin. Kilînîka Elhikme jî yek ji wan cihên tedawiya xwezayî ye ku welatiyên Dêrikê û gundewarên wê serdana wê dikin.

Di derbarê kilînîka Elhikme û çêkirina tedawiyên xwezayî, xwediyê kilînîkê ku mamosteyê Sporê ye Zuhêr Dîban ji Rojnameya me re axivî.




**‘Ji ber sîstema şaş nexweşî zêde dibin’**

Zuhêr Dîban diyar kir ku ew ji bajarê Dêrikê ye temenê wî 47 salî ye, ji sala 1995’an ve di sûka Dêrikê de hat naskirin bi vî karî û wiha got:” Ev 9 sale min kilînîk vekir lê beriya wê min li mal kar dikir. Ez karê tedawiyên xwezayê û dermanên alternatîf dikim. Di heman demê de di nav gel de nexweşiyên wek kolon, kurçik, keçelî û dil hene ez derman çêdikim û ji ber ku ez mamostê sporê me û min terapiya fîzîkî xwendiye dema lêstikvanên gokê di lîstikgehê de derbeyên gokê dixwin ez wan tedawî jî dikim. Çi kesê ku berê xwe dide min bi tenduristiyeke baş vedgere. Dema ez piçûk bûn dapîra diya min û dapîra bavê min karê çêkirina giyayên xwezayî dikirin her tim min li wan temaşe dikir û dema ez mezin bûn mereqbûna min ji vî karî re çêbû. Di heman demê de dema ez li leşkeriya Sûrî bûn xortek hebû kurdê Şengalê bû hin pirtûk li cem wî hebûn yên giyayê xwezayî bûn wî ez fêr kirim ku her giyayek ji bo çi nexweşiyê ye. Di herêma me de gelek nexweşî derdikevin ev yek ji sîstema me ya xwarinê ya şaşe, di dema berê de dema herkesî xwarina xwe ya sedan dixwar rastî nexweşiyan nedihatin lê di dema niha de dev ji vê yekê berdane û nizanin bandor li tenduristiya wan dibe.”

Dîban axafinên xwe bidawî kir û wiha got: “Du cûreyên giyaya li cem min hene gelekî baş in û kêfa min jî ji wan re tê yek navê wî Gezgezke li gundê qeserdîbê û Tildarê derdikevê, yê din jî navê wî Şehfelane kulîlka wê ji bo masûlkeyên mîzê başe û pelên wê dema tên kelandin û mirov vexwe rihên dil vedibe, rihê wê dema derdikevê em dixin nav girêkek hevîr de û deynê ser pişta nexweş heya dehdeqa ev yek sê roja berdewam bike êşa wî diçe. Her giyakek ji bo nexweşiyekî ye lê nabe mirov li ser kêfa xwe dema wî giyayê dirêj bike zêdeyî 10 rojan, ji ber ku di her giyakî de raste sûd heye berûvajî wê zêdebûna wê jî zirarê tîne.”



# Sîstema nenavendî wê mafê gelan li Sûriyê biparêze

Navendîbûna Sûriyê ne tenê pirsgirêka gelê Kurd e, lê belê pirsgirêka tevahî Sûriyê ye ji ber ku ev kirîz mafê tu kesî di Sûriyê de naparêze, lê belê Sûriyê ber bi alozî û qirkirinê ve dibe.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Piştî ruxandina Rêjîma Baas di 8’ê Kanûna 2024’an de Sûriyê kete qonaxek nû, ev qonax bi hatina Hikumeta Şamê ya veguhêz tê naskirin, ev qonax tenê guhertin di nav de çêkir. Sûriyê bi ruxandina rêjîma Baas û hatina Hikumeta Şamê ya veguhêz li ser desthilatdariyê re, tu guhertina siyasî çênekir herwiha di heman çarçoveyê de navendîbûna Sûriyê diparêz e û rêbazê neqebûlkirina gelan û netewan dimeşîn e. Gelo ev hikumet bi navendîbûna Sûriyê wê mafê Sûriyê biparêz e? Navendîbûna Sûriyê ji bilî alozî û parçekirina Sûriyê tiştekî bi xwe re nayîne, ji bo vê jî Rêveberiya Xweser, QSD’ê û tevahî gel şerê ji bo ne-navendîbûna Sûriyê dikin.




**Bi hişmendiya heyî re wê pêşeroja Sûriyê ber bi ku ve biçe?**

Navendîbûna Sûriyê wê Sûriyê ber bi qeyran û şerê navxweyî ve bibe. Di nava Sûriyê de eger alûziya navendîbûna Sûriyê were pêk anîn wê şerê navxweyî di nava Sûriyê de dest pê bike, ev şer wê bi xwe re roj bi roj alûziya sûriyê kûrtir bike û wê Sûriyê ber bi parçebûnê ve bibe. Li sûriyê hêvî ew bû ku piştî ketina rejîma Baas aramî û aştî pêkwere û dawiya tûndiyê were, lê berûvajî wê, rojane komkujî li ser gel pêktê û kiryarên dijmirovî di serî de li hemberî jinê têne meşandin.

**Pêwîste mafê gelan li Sûriyê were parastin?**

Bi hişmendiya ku hikumeta veguhêz ya şamê re wê mafê tu gelî neyê parastin, berûvajî vê yekê, rojane li ser gelan komkujî tê pêkanîn û zimanê ku gelan diberde hev û di navbera gelan de şerê navxweyî pêşdixe û neqebûlkirina gelan ji hevre ava dike. Komkujiyên ku li barava Sûriyê li ser gelê Elewî û li Siwêda li ser gelê Durzî, herwiha li ser gelê Xiristiyan û komkujî û gefên li ser kurdan rastiya vê yekê radixe ber çavan.

Zihniyeta ezezî, desthilatdarî û tunekirinê ji aliyê hikumeta Şamê ya veguhêz li ser gelê Sûriyê tê meşandin, ev hikumeta ku vîn û hebûna gelan qebûlnake wê çawa pêşerojek bi ewle û qaşo demukrasiyê ji bona sûriyê pêkbîne. Rasiya heyî li cem hemû gelan fikarên cuda bi xwe re tîne û gel ji bona pêşeroja Sûriyê bi guman û fikarin û rewşa heyî tu hêviya ku wê aramî û aştî li Sûriyê pêkwere nade.



**Di siberoja Sûriyê de wê mafê jinê çawe were parastin**

Li Sûriyê bi hatina hikumeta şamê ya veguhêz re jin ji hemû milî ve hat piştguhkirin û di hemû warî de mafê wê tê binpêkirin, herwiha li ser jinên Elewî, Durzî û Xiristiyn û kurd komkujî têne meşandin, têne revandin û destdirêjî li ser wan tê meşandin. Di nava rêveberiya nû ya hikumeta veguhêz ya şamê de, tu cihê jinê tuneye û tenê çend jin di rêveberiyê de cihdayîna wan, ew jî ji bona xapandina raya giştî ye.

Ger ku di pêşeroja Sûriyê de mafê jinê neyê misogerkirin, ne gengaze ku mafê civakê jî were misogerkirin, ji ber ku pêwîste di serî de mafê jinê were parastin. Lê ji ber ku hikumeta şamê ya veguhêz, li pey desthilatiya xwe ketiye û tu derdê wê yê xwedîderketina li civakê û rewşa civakê tuneye, ji ber wê ji hemû milî ve civak tarûmaro dibe û hemû dewletên dervejî herkes li gorî bercewendiyên xwe rêveberiya şamê û gelê wê ji bona xwe bikartîne. Di nava bazariya ku li ser Sûriyê tê meşandin, hikumeta şamê ya veguhêz gihiştiye wê astê ku welatê xwe û gelê xwe pêşkêşî hêzên derve dike û mîna gurekî dev bi xwîn xwîna gelê xwe dirgîne û vê yekê ji bona xwe jî mîna şanaziyekî dibîne. Herwiha ger ku di nava Sûriyê de deng û rengê jinê tune be, tê wateya ku Sûriyê û pêşeroja Sûriyê jî tune ye. Di siberoja Sûriyê de pêwîste ku jin cihê xwe di hemû warê jiyanê de bigre û tucaran neyê piştguhkirin. Ji ber ku jin hem di dîroka sûriyê de û hem jî di roja îro de bedelin giranbuha dane ji bona azadî û demukrasî pêkwere û ew ji hemû milî ve pêşengiya civakê dike.

**Pêwîste demukrasî û aştî li Sûriyê pêkwere**

Rojane li seranserî Sûriyê û bi taybet li berava Sûriyê li ser gelê Elewî di heman demê de li ser gelê Kurd, Durzî, Elewî û Xiristiyan komkujî, qirkirin tê meşandin. Gelo ev gelê ku tê qirkirin, ne gelê Sûriyê ye, ew nexwediyê vê xakêye û nexwediyê dîroka vî welatiyê ye. Çime bi vî rengî tê kuştin û komkujî rojane li ser tê meşandin û ji heft salî heyanî heftî salî tê tunekirin. Tişte ku bala mirov dikşîne, li ber çavê her kesî ev yek tê kirin û kes dengê xwe nake, jin têne kuştin, revandin û tezawizkirin û mirov têne serjêkirin û şewitandin û her tişî bi ser gelan de dikin, lê kes dengê xwe nake. Mirovahî bê hîs û bê wijdan maye, her tiş bûye berjewendî û ji bona parastina berjewendiyan her tiş mubah tê dîtin. Mirov bûye gurê mirov, ne axlaq, ne jî wijdan û ne jî pîvanê mirovatiyê maye li holê. Civaka ajalan jî ne bi vî rengî ye û rewşa heyî pir xeternake û pêwîste civak tev li hemberî vê rewşê serî rake û li ber xwe bide.

Gelên ku li ser xaka Sûriyê dijîn hemû xwediyê vê xakê ne û kes ji kesî çêtir nîne, hemû gelan bi hevre ev ax parastin û xwîna xwe ji bona vê xakê rijandin û mafê her kesî heye ku li ser vê xakê bi rengekî azad bijî û jiyaneke biromet bijî.

**Riya çareseriyê hevgirtina gelan e**

Bi dirêjya alûziya Sûriyê, her tim hewildana hêzên navdewletî û heremî ew bû ku alûziya Sûriyê hîn kûrtirbibe û riyên çareseriyê hemû werin girtin. Di serî de rejîma Baas jî amûrek bû ji bona pêkanîna vê yekê, ji ber ku her tim hewildana rejîmê ew bû ku pirsgirêkên heyî bi komkujî, qirkirin û şidetê çareser bike.

Hêzên navdewletî û heremî jî her tim ji bona parastina bercewendiyên xwe sûriyê û gelê wê ji bona vê yekê bikaranîne û tucarî ji bona ku aştî û aramî pêkwere tiştek nekirine, berûvajî wê êş, azar û pirsgirêkên li sûriyê têne jiyan kirin hîn kûrtirkirine û riyên çareseriyê hemû xetimandin.

Hêvî ew bû ku piştî 13 salan ji şoreşa Sûriyê û şer, pevçûn û qeyrana heyî aramî aştî li Pêkwere; lê berûvajî vê yekê rewşa heyî hîn alûztir bû û Sistema heyî ji ya Baas hîn xirabtire û gel bi fikare ku wê rewşa heyî berû kûve biçe. Herwiha saziyên navdewletî jî vê yekê bi çavê xwe dibînin, lê dengê xwe nakirin û ger ku tiştekî bêjin jî tenê gotin dimîne, sankî cîhan mîna zagonên daristanê lêhatiye, yê xurt û bi hêz û çekên wî heye û pişta wî heye, yê din dixwe û tu pakî û hesabî ji kesî re nake.

Li beramberî rewşa ku li seranserî Sûriyê tê jiyan kirin, sistemê rêveberiya xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimîna riya yekane ya xilasiya gelê Sûriyê. Ji ber ku rêveberiya ku hatî avakirin, herkes cihê xwe têde dibîne û mafê her kesî têde tê parastin û li ser bingehê yekîtiya gelan û netewa demukratîk û jiyana hevbeş kar û xebat tê kirin. Ji bona vê yekê di serî de gelê Sûriyê û civaka welatên heremî û cîhan tev vî sistemî ji bona siberoja Sûriyê herî sistemê guncaw dibînin û erkê ku dikeve ser milê Rêveberiya xweser ew e, ku sistemê heyî ji bona tevahî sûriyê bike mal û xwedî li destkeftiyên ku bi xwîna gelan pêkhatine derkeve.

# ‘Hikmet Hebîb: Pêşeroja Sûriyê ji bo herkesî girîng e’

Endamê Desteya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hikmet Hebîb diyar kir ku hikumeta veguhêz a Şamê cihê ku li gor hêvî û daxwazên gelên Sûriyê tevbigere berovajî wê roj bi rojê desteka civakê wenda dike û bi taybet a pêkhateyan."

**Amara Baran/Qamişlo**

Di Derbarê rewşa Sûriyê de Endamê desteya têkiliyên derve yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hikmet Hebîb bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.



**Ji destpêka ketina rêjîma Baas gelê Sûriyê bi hêvî bû ku rewşa Sûriyê ber bi aramiyê û çareseriyê ve biçe sedem çi bû ku rewşa heyî ji berê xirabtir bû?**

Guhartinên ku piştî ketina rejîma Baas rûdan, di bingehê xwe de bi destê hêzên navdewletî û heremî pêk hat û bi taybet piştî ku gropên bi ser îranve girtin hedefa xwe û lewaz ketin. Leşkere rêjîma baas bi tena xwe man û li beramber hêzên ji HTŞ'ê jî li ber xwe neda û di hefteyekê rêjîm ket û deverên bin serweriya rejîma Baas de bûn ketin destê HTŞ'ê de. Bi ketina rejîma Baas gelê Sûriyê bi hêvî bû ku rewşa Sûriyê hîn baştir bibe û li seranserî Sûriyê aramî, aştî û çareserî pêkwere.

Lê li ber hişmendiya heyî û gavên tek alî ku hikumeta demkî davêje rewşa heyî hîn azûltir bû, ji ber ku hikumeta Sûriyê ya veguhêz bi tena serê xwe û bê ku pirrengiya Sûriyê û mafên gelê Sûriyê li ber çavan bigre rewşa Sûriyê srûbino kir û Sûriyê kire rewşeke ji berê xirabtir û alûziyên heyî hîn kûrtirkirin.

Gavên ku hatine avêtin yekem tişt Hikumeta veguhêz ya Sûriyê pêwîst bû ku konseyek veguhêz a demikî avakiriba, ew konseya demkî wê dikarî li ser meseleya destûrê bisekiniya. Herwiha û li gorî wê yekê li ser mijara kesên ku sûç kirine rawesete û wan dadgeh bike. Xalên girêdayî mijara artêşê wê bi çi awayî were rêxistinkirin û hemû sazî wê bi çi rengî werin tenzîmkirin. Ev hemû ji aliyê vê konseyê ve wê bihatibane birêvebirin. Lê ev yek nekirin û di destpêkê de hemû karmendên saziyan ji kar derxistin û valakirin, artêş belav kirin, hema hema hemû saziyên dewletê vala kirin û tiştek bi ser hev de nehêştin. Piştî demekê dema ku dîtin sazî bi vî şêwazî nayên birêvebirin. Bi vî şêwazî hikumeta Sûriyê ya veguhêz li şûna ku alûziyan çareser bike, bi vê nêzîkatiya xwe bingeha avakirina alûziyeke nû di Sûriyê de avakir. Xelkên ku di van saziyan de kar dikirin, bi yek carî xwe derveyî erk û karê xwe dîtin, ev yek bû sedema nerazîbûnan. Bi kurtasî hiştina artêşek ji karmend û rêveberiyên saziyan derveyî kar, bi tena serê xwe nerazîbûneke pir cidî derxist holê. Her wiha artêşek ji kesên bê kar avakir.

Naha pir eşkerye ku rewşek dervî kontrolê bi rêve diçe. Di heman demê de nêzîkatiyeke giştî li hember gelê Elewî hat kirin, li şûna ku kesên sûcdar dadgeh bikin, û waha adaletê pêkbînin, mijar xistin çerçeva tayfêde. Di vê mijarê de dibe ku haya me ji mijarekê hebe ewjî, artêş û saziyên ewlekariya rêjîma baas ne tene elewîbun, bi tabet di dema şerde hejmarek mezin ji sunniya pêk dihat, yanî kuştinên bi ser sunniyan de hatî bi destê berpirsyarên rêjîmêbu ji herdu tayfabun. Nahajî tayfekirina van qirîza tiştekî gelek xetere.li ser pêkhateya Elewî komkujî pêkhat û di encamê de nerazîbûnên gel li hemberî van kiryarên dijmirovî derketin holê, ji ber ku hikumeta Sûriyê ya veguhêz li şûna ku rewşa heyî ji hemû milî ve li ber çavan bigre û xwe bi gel bide qebûlkirin, berûvajî wê birîn û êşên gel girantirkir. Hikumeta Sûriyê ya veguhêz di bingeh de ket nava rewşeke ku çawa xwe di hundirê Sûriyê de hakim bike û bi sistemekî navengî Sûriyê birêve bibe.

Di serî de li ser gelê Elewî û bi hinceta ku bermahiyên rejîma Baasin komkujî pêkanî. Herçiqasî ku di dema Esed de di nava kar û cihên taybet û istixbarata Sûriyê de, ne tenê elewî hebûn, lê berûvajî wê yekê ew kirin hedef û qirkirin li ser wan pêkanî û gelek ji wan qetilkirin û jin revandin, tecawiz kirin û ev yek bû sersebeb ku gelek Elewî ji cih û warên xwe koçber û penaber bibin.

Dibe ku di asta Rêveberiyê de di nava rêveberiya Baas de Elewî hebûn, lê li kêlek wan Sûnî jî hebû û bi hezaran kesên Sûnî di bin sîwana wan de kar dikirin. Herwiha bi destê Suniyan Sunî hatin kuştin, ev yek ji aliyê rêjîma Baas ve dihate meşandin û ew jî mîna lîstokekê li ser gel dihate meşandin. Lê rejîma Baas him Elewî û him Sunî jî kirin qurbanê siyaseta xwe. Hemû jî ji bo parastina desthilata xwe kir. Angu rejîma Esed ewqas siyasetên qirêj didan meşandin da ku desthilatdariya xwe berdewam bike. Di dema îro de jî hikumeta Sûriyê ya veguhêz jî li gorî wê siyasetê tevdigere, Ji ber wê yekê tişta ku niha tê kirin gelek xetere û dawî lê nayê.

**Hevdîtinên we bi hikumeta Şamê a veguhêz re gihiştin çi encamê û astengiyên heyî çi ne?**

Di mijara astengiyan de yek pirsgirêkekî bingehîn heye, ew jî di mijara entegrasyon çi ye, famkirina me ji entegrasyonê re çi ye û ya wan çi ye; di vir de pirsgirêkekî cidî heye. Di serê wan de entegrasyon; teslîmkirin e, em jî dibêjin qebûlkirina a lihember hev e. Ew ê jî me nas bikin, em ê jî wan nas bikin, em ê bi hev re hinek saziyên nû ava bikin. Mîna artêş, saziya ewlekariya hundirîn, hikumet, perleman û hwd. Ev divê bi ked û hewildanên hevbeş bên kirin û li gorî wê saziyên dewletê ava bibin. Ji milekî din ve jî, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, weke ku tenê Kurd hene; em wisa nafikirin, pêkhateyên din yên Sûriyê jî hene, ew jî derveyî çareseriya siyasî di Sûriyê de ne. Angu pêvajoya veguhêz a ku çêbûye, divê her kes tê de cihê xwe bigre û nêrînên hevbeş derbikevin.

Kongreya Netewî ya ku hatiye lidarxistin, qaşo Kongreya Netewî ya diyalogê hat lidarxistin ku welatekî ewqas tê de pirsgirêk hene, helbet ne gengaze ku di kongereyekî wiha de hemû alûziyên Sûriyê bên çareserkirin. Lê ruxmî vê yekê jî kongire hate lidarxistin û hikumet jî hat îlankirin û niha jî tê gotin ka bila her kes tevlî me bibe. Dema ku em ji wan re bêjin ka bile yek du wezaretan bidin me, ango nûnerên me jî bile di rêveberiyê de hebin, wê bêjin em nadin. Di parlemenê de pêwîste em nûnerê xwe diyar bikin, lê derfetê vê yekê jî nadin me. Yek alî tevgerandin heye, mantiq û nêzîkatiyeke şaş ji entegrasyonê re heye.

Dibêjin welatiyên ku di nava rêveberiya xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de cihê xwe digrin û ji ber ku ne wan erkdar kirine, amede nînin ku qebûl bikin û bêjin ev jî saziyên dewletê ne. Nikarin bêjin kesên ku birêve dibin em wan qebûl dikin û ji tiştekî wiha re jî ne vekirî ne. Dema tu li hember viya ne vekirî be, tê wê wateyê ku di nava 3 Milyon însan de zêdetirî 200 hezar kes li ser kar in, dikare bêje em van qebûl nakin û ne karmendên dewletê ne. Di vir de astengiya herî mezin a entegrasyonê li pêşiya diyalogê derdikeve ev yek e.

**Komkujiyên li ser Siwêdayê û berxwedana gelê Durzî ji hikumeta Şamê ya veguhêz, herêm û cîhanê re çi da isbatkirin?**

Rewş û komkujiyên ku li Siwêdayê hatine pêkanîn, ew jî dişibe rewşa Beravê. Çima rewşa Siwêdayê bi vî rengî teqiya? Siwêda di dema Rêjîma Baas de jî ne bi awayekî hişk di bin kontrola hikumeta Esed de bû. Ji destpêka alûziya Sûriyê ve, ew herem xwedî sekneke xwe ya bê alî bû. Mînak bi fermî ji hikumetê re gotin em zarokên xwe naşînin leşkeriyê, em tevlî şer û komkujiyan nabin, lê em li dijî we jî nabin xwedî helwest. Rêjîma Baas jî ev yek ji durziyan qebûl kir û rewşekî xweser ji Durziyan re hebû. Lê hikumeta veguhêz ya Sûiryê û hîn tu baweriya gel qezenc nekiriye û bêyî ku taybetmedî û xweseriya ku Durziyan ji xwe re avakirine li ber çavan bigre, yekser xwestin wan jî bixin di bin serweriya xwe de.



Mesela ketina bin kontrolê, an jî ketina di nav hev de û entegrasyonê ji hev du ferq dike. Hikumeta heyî ev rewş negirt ber çavan. Ji ber wê li ser Durziayn mîna Elewiyan komkujî hatin meşandin. Herwiha komên ne Sûrî bi hejmareke mezin di bin siya hêzên ewlekariyê ya hikumetê de hatine bi cih kirin. Dema li her derê pirsgirêkek derdikeve û ketina wan a nava tevgerê de, wê helbet komkujî û qirkirin çêbibin. Ji bo wê jî hikumeta veguhêz helwesta xwe li hember van kesan diyar nekiriye. Her tim ji hêzên derve re dibêje hinek dem bidin me, em ê çareser bikin û kontrol bikin, lê her kes dizane ku bi vî rengî nabe û nayê kontrol kirin. Her wiha her carê komkujî çêdibin dibêjin hin kesan cilên artêşê li xwe kirine û wisa dikin, dema komkujiyên Beravê çêbûne tu encama ku kê ev komkujî kirine, derneket holê. Wê di rewşa Siwêdayê de lêpirsîn çêbibe, ger careke din wiha bibe wê demê bi rastî rewşa Sûriyê ber bi xeteriyeke mezin ve diçe.

**Pêşeroja Sûriyê wê ber bi kûve biçe û senaryoyên ji bo pêşeroja Sûriyê çi ne?**

Li ser Sûriyê bi giştî pêşbirkek heye, di Rojhilata Navîn de Sûriyê rolekê xwe ya girîng heye û ew pêşeroja Rojhilata Navîn diyar dike. Kî çiqas xwedî rol be, ew dikare mifteya Rojhilata Navîn bike destê xwe. Di nav wê pêşbirkê de herê zêde gelê Sûriyê êşa wê dikşîne û bi qirkirin, komkujî û bi penaberiyê re rû bi rû dimîne. Ger hikûmetekê ku nûnertiya tevahiya gelê Sûriyê bike neyê avakirin; bi yek alî bi vî rengî biçe, wê şerekî navxweyî rûbide. Di roja îro de jî dîmenekê bi vî rengî heye û şerekî navxweyî di bin navê ol, mezheb û netewan de tê meşandin, lê dawiya vî şerî wê gelek xirab e. Pêwîste rêveberiya demkî careke din deriyê xwe ji diyalogê re veke.

Ji ber vê yekê pêwîste ku gelê Sûriyê bi hevre bikevin nava diyakogê û piştgiriya hevdû bikin û neyên leyostokên hêzên cîhanî û heremî yên ku dixwazin di navbera gelan de dijatiyê çêbikin. Pêşeroja sûriyê ji bo herkesê girîng e, ji bo diyarkirina pêşeroja sûriyê pêwîste yekîtî û hevgirtina gelan pêk were.



# 11 sal bûrîn, hîna çarenivîsa zêdeyî 6 hezar Êzidî ne diyar e

11 sal li ser fermana 74'an a ku çeteyên DAIŞ'ê di derheqê civaka Êzidî de pêk anî, derbas bûn. DAIŞ'ê bi hovîtî civaka Êzidî li Şengalê di 3'ê Tebaxa sala 2014'an de da ber qirkirinê. Piştî 11 salan hîna jî çarenivîsa 6 hezar û 417 kesên Êzidî ne diyar e.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**



**Destpêka êrişê**

Bi armanca pêkanîna fermana 74'an li ser civaka Êzidî çeteyên DAIŞ'ê bi hevkariya dewleta Tirk amadekariyên xwe kirin. Di seet 2'ê şeva 3'ê Tebaxa 2014'an de, di şeveke tarî de DAIŞ'ê bi hişmendiya xwe ya reş û tarî, şev li Êzdiyan reştir kir. Bi şûr, tiving û banga Ellahû Ekber êrişeke pilankirî berda li ser gundên weke Til Ezêr, Kerzik, Cedala û Sîba Şêx Xidir kir. Di kêliyên destpêka êrişê de Pêşmergeyên PDK'ê xwe ji Şengalê tevî vekişandin û gelê wê radstî destên qirêj ên DAIŞ'ê kirin. Civaka Êzdî ji bo ku xwe biparêzin gelek hewldan kir, xwestin gelek xendeqan bikolin, wan bi çekên biçûk û hindik demeke kin li ber xwe dan, lê çeteyên DAIŞ'ê bi hovîtî êrişên xwe domandin.

**Komkujî, koçkirin û revandin**

Çeteyên DAIŞ'ê bi dehan komkujî di derheqê civaka Êzdî de pêk anîn, gelek kesên şahidên bûyerên komkujiyan bûn ji wan kesek bi navê Fewaz Emo bû, ew ji komkujiyê xelas bûbû, bûyer li pêş çavên wî hat pêkanîn û tê de jî 80 kes li bin dareke Şengalê bi guleyan jiyana xwe ji dest dan, di nav wan de kesên birîndar hebûn û di encamê de hatin kuştin. Lewma jî heta roja îro 43 goristanên komî hatine dîtin, herwiha çarenûsa 6 hezar û 417 kesî jî hîn nediyar e, di nava wan de mêr, jin û zarok hene. Di encama vê fermanê de 500 hezar Êzdî ji malên xwe bi sedema tirsê û parastina jiyana xwe hatin koçberkirin, di nav wan de bi sedê mirovan vekişiyan çiyayê Şengalê, lê ji ber dorpêçê û tunebûna debarên jiyanê, jiyana xwe ji dest dan. Di êrişa li ser Şengalê de bi hezaran Êzdî hatin revandin, ew weke kole û mertalên zindî ji hêla DAIŞ'ê ve hatin bikaranîn, li gundê Koco tenê 400 mêr hatin kuştin û hezar jinên wî gundî hatin revandin.

**Ji wê demê heya niha kesên revandî û kesên hatin rizgarkirin:**

Li gorî rojnameya The National a Birîtanî 6 hezar û 417 kes ji gelê Şengalê di sala 2014'an de hatin revandin, herwiha ji wê demê heta niha nêzî 3 hezar û 590 kes ji destê DAIŞ'ê hatin berdan. Li aliyekî din Ajansa Firans 24 tekez kir ku heta destpêka sala 2025'an derdoar 150 hezar penaber ji Îraqê vegeriyan Şengalê. Lê dîsa jî gelek penaber li kampên Başûrê Kurdistanê ne û ji ber kêmbûna debarên jiyanê ya Şengalê venagerin. Ajansa Reuters û The Guardian tekez kirin ku zêdeyî 155 hezar penaber li kampên Başûrê Kurdistanê û bajarên wê di şert û mercên zehmet de dijîn. Piraniya wan jî ji ber metirsiya ji çeteyên DAIŞ'ê ya ku hîna weke kabûsekî ye, ji ber ku tê zanîn hîna xeteriya DAIŞ'ê li Îraqê bi dawî nebûye.

**Helwesta navnetewî têkildarî fermana Şengalê**

Di sala 2016'an de Neteweyên Yekbûyî tiştên ku li Şengalê bûyî bi fermî binavkirin û xwest ku di 11'ê Îlûna sala 2024'an de Tîma Neteweyên Yekbûyî ya Rapirsînên li ser Komujiyên DAIŞ'ê, raporeke berfireh belav kir. Ew rapor derbarê komujiya Şengalê ya ku bi destê DAIŞ'ê hate kirin, tê de jî bi belgeyan hate tekezkirin ku DAIŞ'ê kiriyarên dermirovî û komkujî di derheqê civaka Îzdî de pêk aniye.

**Rizgarkirina civaka Êzdî ji qirkirinê**

Pêşengên pêngava rizgarkirina Şengalê HPG, YPJ û YPG'ê bûn bi fermandariya Egîd Civyan, Dilşêr Herekol û Nûjîn. Bi hestên tolgirtina jin û zarokên Êzdî bi coş û kelecanê şervanên fedayî dest bi operasyonekê kirin. Pêngava rizgarkirina bajarê Şengalê bi banga Rêber Apo di dîroka 11'ê mijdara 2015'an û bi alîkariya hêzên Yekîneyên Parastina Gel (YPG), Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), Gerîlayên HPG û bi tevlîbûna ciwanên Êzidî yên welatparêz destpê kir. Ji bo rizgarkirina bajarê Şengalê, ji bo bi PDK'ê re hevbeş operasyon bê destpêkirin hewldanek ji aliyê fermandariya YBŞ'ê de hat kirin. Lê PDK'ê ji ber hebûna Tevgera Azadiyê înkar dikir, qebûl nekir. Fermandar Egîd Civyan wiha digot, 'Gava PDK'ê hat operasyonê, ne ku Şengalê ji DAIŞ'ê rizgar bike, weke ku hewl bide têxe bin serweriya xwe de. Herwiha di roja 13'ê Mijdara sala 2015'an de Şengal bi temamî ji destê DAIŞ'ê hat rizgarkirin.

# ‘Sedsala nû wê bi ramanê Rêber Apo tacîdar bibe’

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Endamê Meclisa Ciwanan A Dem Partî Devran Şîmşek diyar kir ku bi peyama Rêber Apo ya ‘Xwe û gel rêxistin bikin’, rola ciwanan ew e ku bên ba hev û hêza xweparastinê ava bikin û yekperestiya pergalê qebûl nekin û got, “Em ê sedsala nû bi pratîkirina pêvajoya Rêber Apo biparêzin.”**



Ji bo her civakekê rola ciwanan a herî sereke ye, dema ku ciwan xwedî hêz û fikrên azad bin, dikarin li hemberî her siyasetê xwe û civaka xwe biparêzin. Lewma di her demê de yên ku rastî şer û siyasetan tên ciwanin, ji ber bi tunekirina hêza ciwanan, hêza civakê jî tune dibe. Ciwanên Bakurê Kurdistanê jî ji bo ku ji yekperestiya pergalê xwe rizgar bikin, avakirina xweparastinê pêwîst dibînin. Di heman demê de fikir û projeyên Rêber Apo çareserkirina kirîzên Rojhilata Navîn dibînin û pêkanîna pêvajoya nû ya ku Rêber Apo daye destpêkirin hewcedariya herî mezin dibînin.

Derbarê rola ciwana li Bakurê Kurdistanê û berpirsyartiya wan ji pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk re, endamê Meclisa Ciwanan A Dem Partî Devran Şîmşek ji Rojnameya me re axivî.

Devran Şîmşek diyar kir ku pêwîst e ciwan hêza xwe ya parastinê ava bikin û wiha got: “Bi peyama Rêber Apo ya ‘Xwe û gel rêxistin bikin’, rola me ciwanan ew e ku em bên ba hev û hêza xwe ya xweparastinê ava bikin. Paşê jî xwe bi awayekî komînal rêxistin bikin û derdora xwe jî li ser vî bingehê rêxistin bikin. Peywira me ya bingehîn ew e ku em dîrok, çand û nasnameya xwe ya etnîkî bikolin, wan derxin holê û yekperestiya ku pergal li me ferz dike, divê em wê qebûl nekin û dive em jiyaneke bi hev re ava bikin. Li ser vê esasê, ev yek ji peywirên me yên herî mezin e ku em van pêk bînin.”

**‘Şoreşa Rojava şoreşa herî mezin a azadiya jinê ye’**

Devran Şîmşek tekez kir ku baweriya gel û ciwanan a bi Rêber Apo re zelal e û wiha bilêv kir: “Wek ciwanan me parastinên Rêber Apo xwendin û me li ser bangewaziya niha ya Aştî û Civaka Demokratîk nîqaşên xwe kirin. Di van xebatan de me careke din dît ku baweriya gel û ciwanên me ya bi Rêber Apo re zelal e. Me li ser wê yekê nîqaşên xwe kirin ku modernîteya kapîtalîst niha di krîzekê de ye û çareseriya vê yekê jî tenê bi rêya avakirina modernîteya demokratîk dikare pêk were, em ancax wisa dikarin kirîz û şerê li Rojhilata Navîn bi dawî bikin û gelan di meclisên taxan de bi rêxistin bikin, piştre bi rêya wan rêveberiyên xwe yên xweser ava bikin û jiyana hevpar dayînin. Li vir bingeh ew e ku em li ser bîrdoziya azadiya jinan hûr bibin, Şoreşa Rojava bikin pratîkê ku li Rojhilata Navîn şoreşa herî mezin a azadiya jinan e û felsefeya ‘Jin, Jiyan, Azadî’ li tevahiya cîhanê belav bikin, li ser vî bingehî rexne û têkoşîna jinan û jiyana hevpar bidin naskirin.”

**‘Bi avakirina meclisên taxan em ê rê li ber şerê taybet bigirin’**

Devran Şîmşek eşkere kir ku endamên şerê taybet madeyên hişbirê dixin taxên welatparêz û wiha pê de çû: “Bi giştî, em bi şerê taybet re rû bi rû dimînin. Ciwanên me ketine destên çeteyan û em dibînin ku endamên şerê taybet bi xwe madeyên tiryak û hişbirê dixin nava ciwanên me yên welatparêz û li taxên ku lê dimînin belav dikin. Têkoşîna herî mezin a li dijî van ew e ku em meclisên taxan ava bikin, çalakiyan li dar bixin û xwedî li ziman, çand û dîroka xwe derkevin, hem jî em xwe di aliyê zanistî û civakî de bi pêş bixin. Wekî me li jorê jî gotî, em hewil didin ku pergaleke wisa ava bikin ku em ziman, çand û dîroka xwe û xwe bi rê ve bibin.”

**‘Sedsala nû wê bi pratîkirina pêvajoya Rêber Apo dayî destpêkirin were parastin’**

Devran Şîmşek di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku xwedîderketina li pêvajoya Rêber Apo xwedîderketina li sedsala nû ye û wiha qedand: “Berpirsyariya me ew e ku pêvajoya Rêber Apo daye dest pê kirin, em xwedî li wê derkevin. Xwe û gel bi rêxistin bikin û parêznameyên rêbertiyê li her derê bixwînin. Di heman demê de ji ciwan û gelê xwe re vê pêvajoyê rave bikin, ji ber zanîna tewriya parêznameyan ne bes e, lê pêwîste ku em wan di jiyana xwe de bikin pratîkê de. Hêza me ya herî mezin ew e ku em bi awayekî kolektîf bên ba hev û di sedsala nû de jiyana demokratîk û azad a gelan biparêzin.”